Derwêş M. Ferho

# Dengê ROJA DÎL

Helbest

TIGRIS

Ji bo bîranîna birayê min yê hêja
**Feylezûr û pêşmergeyên** serxwebûnê.

D.M.F.

Wek çiya qewîn
di doza azadiyê de
weha şîn, rind, delal

T I G R I S
Hejmara weşanê : 2
Dengê Roja Dîl, D.M.F.
Wêne : Siyamend (Têkoşer)

© Copyright
Derwêş M. Ferho
1985 / Bruksel

Navnîşan / Kontakt Adress

T I G R I S v.z.w.
Rijke Klarenstraat, 45
1 0 0 0 B r u s s s l

Hesab No/Brk.:435-0280421-74

Derwêş Mehabad Ferho

# DENGÊ ROJA DÎL

Helbest

# P Ê Ş G O T İ N

Weşandin û nasdana çanda Kurdî amanca weşanxana Tigrîs e. Dengê Roja Dîl, dibe hejmara duwemîn ku em diweşênin. Di dawiya 1984 de pirtûka yekemîn, Lied Der Aarde, bi zimanê Holandî hate çapkirin. Amanca me ne bes weşandina pirtûkên Kurdî ye. Em dixwazin herweha, pirtûkên Kurdî û lêkolînên li ser çanda Kurdî wergerênin zimanên din û bidin çapkirin. Bi vê yekê, wê çanda zengîn a Kurdistan ji aliyê dinya derve zêdetir bê nasîn.

Dengê Roja Dîl, helbestên welatevîniyê ne. Em hêvî dikin ku bi weşana van helbestan tiştekî bidin xwendevanan.

T I G R I S

---

Weşanxana Tigrîs (Kurdiya wê Dîcle ye) ji aliyê du rojnamevan, yek jurist, yek sendikalîst û kurdekî di dawîya 1984 de hate sazkirinê. Amanca vê weşanxanê, weşan û nasdana çanda Kurdî ye.

---

## A x a  m e

Ev ax
tev bûye xwîn
ya mêrxasan

Ev ax
hêstir tev xwînê
ya dayik û zarokan

Kom û qoçanên me ne li hawîrdor
bila kes nebe xwediyê bi sond
lewra, hinerê dest û rayê mêrxasiyê
                qelb ne bû ne

Jîn di çavên belek de xuyaye

## Ewrên reş

Ev ewrên reş li ezmanan
ji çiyayê Cudî bilindtir
xeyidî ne ji me,
loma xwe reş û tarî li hev pêça ne

Di ser serê me ra
bi kîn digerin
mîna leşkerê amirhêzekî fêlbaz
hember dilên zêrîn

# A z a d  d i b i n

Dengek tê guhê min
ji gundan, bajaran
bilind û saf hildibe
di çol û çiyan de

Bi hezaran rabû ne ser xwe
lewja serxwebûnê dibêjin
xwedî bîr û bahwerî
              bi  çek
ser serê dijmin diteqin

Her can buhayê yek berî
lê xem pê naxun
diqîrin bi hemî hêza xwe
bi yek dengî, bi hevra
"Em azad dibin
   li ser axa xwe
   ya bi xwîn sor bûye"

## Birînên xwe dihîvêzim

Ez bindestê sedsalan
şîn dibim hêdî hêdî
di bin zor û tineyîyê de,
wek mîro berhev dikim
zadê azadiyê ji kolanan

Diçirênim van tariyan
bi warê xwe
paqij dikim derdorê
ji lewtê û qirêja qatbuyî

Diqetînim van zincîrên li min pêçayî
bi şûrê bav û kalan
kuhkirî ji aliyê Kawayê Hesinker
dijminê dijmin, rêzanê hêja

Ez dihîvêzim birînên xwe
paş talankirina zorker
di riya zanistiyê de
dibim nîşe
ji giş xebatkarên wekheviyê re
li temamê dinê

Silavê didim azadîxwazan
ji welatê xwe Kurdistan

## Çi dixwazim ?

Hêviyek min heye
di destpêka rê de
                    diçirise
li jêr û jor
   wek stêrikan xûya ye

Carna,
hunda dibe ji ber çavan
lê  ne berrî ye, ji min
baz nade ew

Dîlek girêdayî ye
di bin dest de, hevsarkirî
wek kevoka jiçengbuyî

Xem pê nayê, felek
ceng dibe ji destpêka sbê ve
xêr naxwazim ji kesî

Ez, hêviya xwe bi cî dikim
bi baqê gul û pîvitkan
paş zora zor, kuştina dijmin


Di bîranîna birê min
yê delal Feylezûr de

## Birakî min hebû

Her dom
li her alî
ku li te dinêrim bira
di wêne de çardeh salî
dilopên xwînê dikevin çavên min
ew ne hêstirên eşqa dinê
û ne yên xoşewîstiyê ne
dixindirin jêr

Di bîrên şêrîn
xewn û xeyalan de rind
Tu neqişî yî
bi hezar rengê zêrîn

Loma huner
li ser sînga min dimexele
xem û zexelî bi hevra
dibin hêvî
dibin mêrxasî
ku xeznê nekêşim bi salan
lê şer bikim
li meydanan
wek govendê bigrim



## Dayika niştîman

Dayika Kurdistan<br>
          reben<br>
perîşan e<br>
dayika belengaz<br>
       birçî ye ew<br>
por sipî<br>
lawaz û dilbirîn<br>
ew ceger tev xwîn e<br>
    her gav û domê<br>
       dike gazîn

Dibêje:

çi bi min hat

bê hiş im

ber xwe nabînim

dinya min hunda buye

wek dîna lê digerim, lê

xuya nake

çi bêbextî ye ev

kes li min napirse

ne li jêr û ne li jor

Sedsala bîsta ye

va bîst û yek hat

ez dayika nexweş hê bindest im

sêwî û reben

bin darê zorê me

bê şerm û bê ol e dijmin

Ne rojek, du

ne sê, çar û pênc

ev dîlînî bes e êdî

çavên min kor bûn ji giriyan

dilopên xwînê ji wan

tên xwar

Loo,
hun lawên min
guh bidin dayka xwe Niştîman:
berî we
ne dûr
di destpêka sedsala bîstan de
law û keçên min
tev rabûn
wek şêr û pilingan
giş mêrxas bûn
cengawer bûn
li hemberê dijmin
çiya kozik
şkeft mal
şînî qûtê wan bû
hember top û balafirên dijmin
kopal û çem, çekên wan bûn

Lawên min
keçên min
sêwiyên bindest
binêrin li min
û qîrînên min bibihîzin
rebenno
dilê min êşiya ye
êşa dîlînî
hêsîrî

Li ser zikê min
xwîn digirîn çavên belek
nuka jî
qîjîna tev zarok û jinan
bi serê çiyan dikeve

Xwîna min bi salan hat rijan
hat rijan, herikî
dîsa sar bû, bû gol

## 15

Bê dilşewat
bê dilêşî û serêşan
li min dixistin

Yek yek
deh deh
bi hezaran
zarwên min di zîndanan de
ketin bin xenceran
hatin kuştin
tên kuştin

Ez dayika Niştîman im
gazî we dikim
laşê min tev buye xwîn
xwîna min
li ser axa min
tu dibe av e
ne ji can e
**bes e êdî, min azad kin !**

Ji bo Ina Leemans

# B i r î n d a r  i m

Ez birîndar im
      birîna min kûr e
wek Mem
Li welêt digerim
      pirr li dûr

Hewar, hey hewar
felek li te hewar
jiyan çi xweş e
ez jê bê par im

Hêviya min şikestî
hergav şîn dibe ji nû
wek gulek sor

Mezin dibe
ew hêviya şêrîn
ji birîna min
         ne dûr

## Kurd in em

Silav ji we tevan re
hun karker û gundî
gelên Kurdistan

Em tev, xwe çek bikin
ji bo şerr
hember dijmin
derxînin ji welêt
ku zanibe em
dijminê dijmin in

Em tev dîlanê bikin
li her alî, wek biran
ava bikin kargehan
û xwendegehan
ji bo jiyanek aza

Em tev bixwînin dîrokê
Şêx Seîdê Kal
Seyid Riza
silavê bidin Qazî Mihemed

Temaşe kin li Şerefnama Şerefxan
li Mem û Zînê ji Ehmedê Xanî
Dîwanên Cigerxwîn
rajin Elfabe ya Bedirxan
û Bozarslan
fêhr bibin zimanê xwe
ku karibin bêjin em
Kurdê Kurdistan in
ne kole û nezan in

# Ji bo azadî

Ez pirr digerim
Kurdistana xwe
her xebat dikim
bo Gulîstana xwe

Venagerim qet ji cengê
her pêşda diçim lo,
jînê xweş dikim

Roj duv rojê de
şerr xurt dikim
him bang dikim
    hemî karkeran
ji bîr nakim ez
    beşê cotkaran

Diçim, diçim
        û her dikim
hember dijminan şerr
wan der dikim derê
ji welatê xwe
            yê bindest

Azadî tînim welatê xwe
ser axa şêrîn, Kurdistan

Ji bo dayka min a delal

## Name (1)

Dayka min
silavan  ji dûr
          pirr dûr, ji te re dişînim
ez, mendalê te biçûk
wek sêwiyan çavan bo te dinalînim

Li vir
          dor xwe dinêrim
jîn xweş e
kom dîlanê dikin
zarok jî dileyizin
                    dikenin
                              dipeyivin
bi zimanê xwe, bê tirs

# 21

Li vir
dor wxe dinêrim
jîn aza ye
aha bi birran pirtûk
yek ji wan navê te li ser e
**Kurdistan**
ne qedexe ye, bahwer bike
hemî kes jî kare wergire
bixwîne

Li vir
dor xwe dinêrim
jîn ne sûc e
kes naçe mahkeman ji ber bahweriyê
ji ber ku Marks dixwînin
nayên bidarvekirin
bi salan nakevin girtîgehên tijî sipih

Lê dayka min
rewş ne weha ye li wir
dizanim
jîn ne xweş e
jîn ne aza ye
jîn ne hêja ye
dîl e ew
nexweşekî birîn kûr e

Ka kîjan kom dîlanê dike ?
ka li ku zarok dikenin ?
karin ew bixwînin
bi zimanê xwe yê xweş ?
ew pirtûkên delal nayên şewitandin ?
girtîgeh ne tijî ne
ji kesên azadî xwestine ?
nayên darvekirin ji ber ku Marks
Lenîn dixwînin ?

# 23

Bi hezaran kes
derneçûn derê ji welêt, dayê ?
ez, yek ji wan
dijminê mêtingehkaran
bi dilê şikestî, hêviya mezin dûrketî

Lê em digerin dayê
tên welêt
soz ji te re
ser dikevin
jînê xweş dikin
bi gel re

Dixemilînin gund û bajaran
marşa serxwebûnê
bi dengekî bilind dibêjin

## Name (II)

Min gotinek rêkir
bo welêt
deng ne hat ber bi min lo,
dixwest bizanim
çi bûye li tor û zozanan ?
da nemîne kula giran
ser dilê hejar
bêkesê li dûr

çi dibe dayê,
weha dimînim
bi heviyê re heval

Min nizanîbû ku dil hatiye,
                                        kuştin

û bi xwe re
hemî hêvî temirandine
tev delal
tev rengîn  bûn
                    ew hêvî
                              di bîran de

wek baxçê gulan

Lê dayê
xem mexwe li ser dilê ciwan
mîna kulîlkek
                    rengareng
                              xweşik
wek pola qewîn be

Dizanim çiye dîlînî li jînê
lewra ez qurbanim
bi hezar birînî
her yek ji wan kûr
                pirr kûr
wek çala bê binî be

Ji te re bêjim dayka delal
şîrê te
      min vexwariye
yê ku te da birê min
                kelandî
bi germa rojê
ji bo roja reş û tarî
hember zorê

Iro ewr di ser me re digerin dayê
lê bi tirs in
wek qîrê reng dayine
    baranê direşîni ser me
lê ew nizanin ku
                xwedî sebr in em
hez ji merovan dikin
                û aştîxwazin

Lê ger ew neçin ji warê me dayê
dev ji xayintiya xwe neberdin
û dijmin bimînin tim
em, wek bombê diteqin hînga
di bejna wan de
û teyrokê rêdikin
                hember barana wan


Wek gulle
sor û tûj, ji mirinê re mar
xerabtir ji xwedanê zengînan

Ji bo Rûken Banû

## Çanda mêtingehkaran

Ev talan e,
xewn û xeyal
bîrên me jî ji destên me girtin
rohniya di çavan de
mêjiyê me reş kirin, bi qirêja xwe

Ew qirêj
ku ew dibêjin "medeniyet",
hinek jî dibêjin "çekê wehşan e"
wehşên ku navê wan mêtingehkar e




Hember hovan
ji cihekî lorî bilind dibe
ji yê din hawar û axîn
û xiştêna xenceran bi kîn
ji kembera azadîxwazan


# Jinên me

Jinên me ne
di rojên pêş me de,
ewê biçirisin
dest di dest de,
tariyan û wî dîwarê şermê
ji ser xwe
dê bi temirînin
di nav dîrokê de bi degel

## Keça Kurd deng bide

Keça delal benda te ne
çek hilgire, wer tev me be
tu bê me, em bê te
di rewşa Zîna bê Mem de ne

Derxînin mêtingehkaran
bînin wekheviyê
ne ez ji te meztir, ne tu ji min
deynin riknê çandê
çanda merovî
ava kin dibistanan
ji bo zaro û nebiyan
da ew bijîn, her me nikarî bû




# Bo dîlberê

Lê, dîlbera hejar
destên xwe bide destên min
em tev herin cengê
şerr bikin, şerr
bo jînê, jînek aza
aştiyê bînin
paş derkirina dijmin

Xweşî têxin welêt
gund û bajaran
bila geş bibin kulîlkên baxçan
deng bidin kewên ribatê
di kozikan de
bêjin hozanên me lawikê Kulik,
helbestên Cigerxwîn bixwînin
dîlanê bikin tev, hûr û gir

Bes e êdî dîlber
bes e ev dîlî
em heviya delal
şîn bikin
çi bi hirm û gurmê
û çi bi xwendinê
zanistiyê avakin
û konê jînê ji bo rojên pêş me

# Ji xortan re

Lo, delalê şîrîn
ev çi rewş e li dor te
ser giranî
ne rohn û ne zelal î

Geh xuya yî, geh hunda yî
nêzîk dibî, zû dûr dibî
dewr û dem diçe
lê hêjî tu ew mal î

Çav venekî eger
weha dimînî tim
li vî serî û wî serî
cihê te namîne

Dibêjim te
xwe bide hev
dardorê temaşe ke
ka şoreşgêr an xapînok in
hevalbend
eşqî Tor û Zozan in
an axa û Rom in

Icar bêje, tu delalê min

## Ez xwedî birînek reş im

Ez xwedî birînek reş im lo,
birînek kûr e
li ser dilê min
pirr, pirr xedar e

Qet pak nabe lo,
bi dermanê bijîjkan
lewra, birîna min a reş
ji dîlî tê
zora hemdem
pirr kolaye
xerpitandiye derdor

Lê qet nemaye bê hêvî
ev dilê birîndar
xwedî doz
di katê hebûna xwe de

## Dûr im ez

Li cihekî dûr
bê dost, bê yar
hesreta te wek xencerekê
li ser dilê min e

Bes yek gotina min heye bo te:

Kaxet û pênivîsa min
te dinivîse
dildariyê pêşkeşî merovatiyê dike
bi hewarî û rebenî

## Xoşewîsta min welatê dîlan

Roja li dorê dinêrim
weha reben
hînga, destên min
pênivîstoka min nagirin
ku ez te bineqişînim
welat, bê taqet im

Lê ger bikarim
ger jî na
her li bîra min î
her roja min diçe
dilê min bêhtir germ
hê mezintir dibe
ku
bighim te, gula şêrîn

Tu yî gula rengîn
weha xweşik
lê cêhil
pirr saf ma yî
di çerxa bîstan de
li vê dewra reben
asê, asê zincîrkirî

Ji bo Binefşa Bêrîvan

# M e g r î

Dilê ciwan
megrî bi rewşa xwe
                    xemgîn
ev jîn e
giran e li ser milan
loma ev doza kevn
nûh şîn dibe, wek gulek sor
bi hêviyên mezin
paqij
hember xiyanetan, megrî

Memîne şaş
gava destên bavê te bên girêdan
di riya girtîgehê de
meke hewar
meke qîrên dilo

Tu raje qelema wî
tuj bike, nazik
pê mezin bibe, here ser dozê
û bang bike
ku hemî kes bibihîze
li cihê şerr rawestayî
ceng gurr bû
berdewam e di dilê bi kîn de
hê xurttir, bi hêz

## Gula min

Gulek min heye
şêrîn
û delal e

Gulek min heye
bindest
û belengaz e

Dirabim ser xwe
tê bîra min
wek nêrgizek ciwan

Navê wê tekrar dikim
hember dinê
belav dikim
da bizanin dîl e

Ez digerim
li gula sêwî
bêrîvana xelkê

Ez bang dikim
azadîxwazan, bi qîrên
û merovatiyê, hember zorê

Ez radibim
bi birr û alan
ji hawîr, ji hawîrê welêt

Şerr dikim
dijî koledaran
tev azadîxwazên cîhanê

Ez gula xwe
ew jî daxwaziyên xwe
bikaribin ser sînga xwe deynin

## Ew ne mirin e
## Na mirin

Sal 1937
derketibûn serê çiyan
ji dil, di kozikan de
di bin her rohniya rojê de
ji bo azadiyê diteqandin gulle

Can dişewitîn
can diqijilîn di nav agirê sor de
mendalên çavên xwe nuh vedikirin
di bin hêstirên dayikan de
bi qîrîn
bi hewar diketin ser sîngan

Ber kor e
bê xem e li şerr
dihat ser dilên bi kul
birçiyên azadiya xemilî bi xwînê
bi ser zarokan de, devên wan bi şîr
didan erdê
wek sosina bişike

Mêrxas bûn
xwe ji dil dabûne şerr
wek şêrên birîndar hember xayinan
ku bidin zanîn ew,
çi ne şertên merivên cengawer
mêr berberê mêr
di meydanê de ser bilind

Bang dikirin dijminê fêlbaz
ser şertên hodrî meydan
lê, xapînokbû dijmin
derba xwe xafil danî hedef

Bila kes nebê ew ketin
di roja cengê de çirûk bûn
lewra, ketin davê
li çiyayên bi bêhna barûdê

Bi hezaran dilên din
Rizo
wek şêran rakirin ser piyan
di van dilan de dijîn ew
wek cewahir

## Azadî dixwazin

Dîsa ber barîn
bo azadiyê
li çolan
serê çiyan

Gunda û bajarên me
rabûn
hember dijmin rawestan

Dengê van beran
wek lewjan in loo,
serxwebûnê distrînin
ser serê koledaran
hember tank û topan

Çiya birayên pêşmergan in
distrînin tev wan
marşa azadiyê
diqîrin şax û bax

# K î n

Dema kîna min fûrî
di dil de bi kel
van deriyên zingarî
bi kilîtan li ber min asê
dişkînim

Ev girtîgehên mala zilmê
wek qîrê tarî li ber çavan
û zîndan
xanî reş, ode reş
nava zalima reş

Bi îsyana sebra xwe
firmanê radikim
li ser vê jînê
ku dîl e

Dema kîna min fûrî
di dil de bi kel
ji zilmê û koletiyê re
ji tirsa di xwîna min de
li ser ziravan qîr dikim loo !

## Ew bûn li şerr

Ew bûn li şerr
li çiyayên Kurdistan
di nav dar û baran de
di şerrê azadiyê de
dijî mêtingehkaran
leşkerê dijmin

Xweş kiri bûn bi berê tivingê
havîn û bihar
dîlan dikirin, payîz û zivistanê
li ber lewjên beran
dixwestin merovtî û aştî bînin
ger bi xweşî û ger bi darê zorê
li Kurdistan û cîhan

Roj çû ava li azadîxwazan
ketin zorê
ketin gelta xwe
şikestin
lê ne ji dijmin
ji şemarên di kozên pey hêviyê de
xayin

Roj çû ava li mêrxasan
di nav şax û baxan de
li meydan û girtîgehan
ber çavên dinê
çavê sexel

Lê wan, tovê hêviyê
zad barandin li hezaran şêrên me
rakirin dilgeş û pêşwar
ku bêjin bi dilxweşî
"azadîxwazin, naxwazin koletî" !

## Pêşmerge (I)

Ev memyan e
tev rima xwe
ji xwe meztir kesî qebûl nake
jîn naxwaze
dilşkesti ye
eger welatê wî azad nebe

Bi sedsalan e
dîrok tarî
rohniyê dixwaze
ew amanc e

Mêrxas e
naxwaze dîl be
bimîne nezan û xizan
**pêşmerge** ye navê wî
cengawerê azadîxwaz

## Pêşmerge (II)

Loo, **pêşmerge**
tu mêrxasê cengawer
rime rimê bike
tofanê rake li serê dijmin

Serê te tim bilind e
navê te pirr giring e
**şerkerê azadîxwaz**
**tu her bijî**

## Pêşmerge (III)

Pêşmerge, pêşmerge
tu şervan î
mêrxas î
hember dijmin derya yî
pilingê serê çiya yî
bê tirs û ne nezan î

Ne zîndan û ne hêza dijmin
ne kuştin û ne êşandin
çi ne nizanî, bîra te nayê
ji eşqa welêt pê ve
li jînê

Te got: ne jîn e ev
ji ber ne azad im
ne wek meriv xuya me
ji ber kole me
bûm pêşmerge ez
lawê Kurd
şerr dikim
ta ava kim li warê dinê
bingehê jîna aza
wekheviyê di nav merovatiyê de
li welatê xwe, axa Med

# D î l a n

Rabe dîlan
          hember zorê
jînê ava ke li dorê
pêşan bike riya zana
da birîn kûr nemîne

Here dîlan
          pirr dûr here
xebat bike j' gelê xwe re
hişyar bike tev bihevra
da bibîne û bizane

Axa û beg
tev şêx û xan
xayin in ew, namûs tev dan
wan talan kin, derkin j' gundan
da nemînin l' warê dinê

Dîlan rabe
dema te hat
Tor û Zozan ta Mehabad
berhev bike mal û malbat
da gelê Kurd azad bibe

Bi çekê xwe
li ser çiyan
kozik çêke, gel bi te re
ji rojhilat ta rojava
da bizanin şerr wê çêbe

## Stirana dilê min

Gulê tu reben hejar î
belengaz û êsîr yar î
ji serî ta dema dawî
li te bû zora neyarî
    ax gulê, can gulê
    yar gulê, gulê şêrînê

Ma ka kengî tê azad bî
dijmin derçî, xweşî der bî
Ala rengîn wê bilind bî
li cihê ala zordarî
    ax gulê, can gulê
    yar gulê, gulê şêrînê

# 55

Dilêm, peyvek ji te re dikim
dîliya xwe pêşan dikim
serê xwe ji bo te didim
bo azadî dij neyarî
ax gulê, can gulê
yar gulê, gulê şêrînê

Gulê tu çiqas xweş yarî
ser û binî sor û şînî
eger rojek azad bibî
dîlan dikim li her alî
ax gulê, can gulê
yar gulê, gulê şêrînê

Bêjin bes e koletî
Bijî bijî azadî

Silav ji we tevan re
hun karker û xwendekar
hun gundiyên Kurdistan
hun rêncberên Gulistan

Werin biçin Kurdistan
dijmin jê derxînin
welatê xwe azad kin
serxwebûnê bibînin

Bi qîrîn bêjin azadî
hun karker û gundî
bêjin bes e koletî
bi dilxweşî û hevaltî

## Ji dotmamê re

Çavên belek re deng dikim
şêrîna delal
di dîldariya reben de
sêwî ne em
        bindest

Herçend e şerrê sor dikin
lêvên me çiriyan
        destên me kul bûn
lê tofan
        naçe ji serê me

Berber in em
        dîrok zane
kozan xira dikin
bi ser hemberên xwe de
ger hût be
        hevalbendê xwedê

Roja hêlanê
li meydanan
eniya me hildayî
sînga me vekirî
diçin ser dijmin
jîn dixwazin
aha nîşan



## Têkoşer in em

Têkoşer in
şerker in em
li serê çiyan digerin
nakevin û naşikin em
biserketin amanca me

Xebatkar in
xwendekar in
bi şev û ro li hawîr in
riya azadî divekin
bo welêt û bo gelê xwe

Geh li gundan
            geh li bajaran
li ser çiyan û li çolan
çi bi zorê û çi bi xweşî
Ala rengîn bilind dibe

Silav, silav
            gelên cîhan
dest bidin hev hember hovan
ava bikin jînek hêja
ne begên zor û zilm
ne burjuwayê çav sor tê de

Nizanim jînê ava kim
Ger Tu nebî avayiya min

Bêjim, nebêjim
her li bîra min î
wek siha xwe
li dûv xwe dibînin tim

Xwezî min
Tu ne dîta
nas ne kira
an jî min karîba
bi Te xoş bibim
          dûr û dirêj
bi Te şah bibim
          di jîna xwe de

Di her peyva min de Tu
geh ciwan û rind
geh çirmisî
wek çêlkewê nuhgirtî
xapandiyê xapînokan

Rojên min tev tarî ne
û nizanim çawa jînê ava bikim
ger Tu nebî avayiya min



# Evîndarê welêt

Ev salên şûnda çûn
xêr û bêr nedan
çiqas geriyam jî
      gera min şerr
dîsa min tu ne dîtî

Tu bêndera min î
lê ji destên min î
her roja ber bi te hatim
ketin pêş min
û rê hat birrîn

Bav û kalên min hatin kuştin
bi Kurd û Kurdîtî
ez lawê wan
Al ji dest girtiye min
dema berê kor li ser dil ket

Bindestê dijmin
lê ser hildayî me
bo te çek her hildigrim
ta ku ez bimrim
yan Tu rizgar bî

Lawê kuştî
ji nav mayinan xelas kir
di şêvereşka bi kul de

Li ser laşê lawê xwe
xwehdanê rudên şil kiri bû,
dil qewîn
    ji bin xetê
di nav mayinan re derbas kiri bû,
berî roj hilê
    avêt ser xetê...

Li wira
di nav axa qemirî de
ji germa rojê,
di bin hînkayiya şevê de
Canê wê ye, kuştî...

Ji laşê dilo
lawê mêrxas ne dûr
      deh gav wê de
Xet... Sînor dirêj dibe
di navbera xwişk û biran de
pismam û dotmaman de
wek koremarê havînên qijilî...

Dayê,
di ber xwe de dibêje:
      ev mayin yek bi yek
      bibane gul
      û kulîlkên rengareng
di bin rohniya rojê de...

## H ê v î

Bi bivir
      bêr
      sêgulî û melhêb
ji kolanan dê rabin
            rabin piyan
hember talanê

        Ji alîkî lîle lîl
        ji yê din qêrîn
        bilind dibe

Nebiyên **Elî Şêr**
çekdarên **Dêrsîm**
dê rabin ser xwe
kozikên neyaran xerab bikin

## Dîroka tarî rohn dikin bi bahweriya xwe

Mêtingehkarên hov
dîsa, dixwazin birêjin
xwîna zelal û delal
dîsa, dixwazin biherike
xwîna şoreşgêran,
li ser axa Kurdistan


Tarî bû, zor e
ev dîrok
paş Medya û Merwan,
kulîlka dîroka bi xwîn
**Komara Mehabad**
tarî ye jîn li me

Îro, rojek din ji vê dîrokê
weha zexel
bê şerm
bi kuştina sedan dilên ciwan
di riya serxwebûnê de

Lê şik û gomanan nakin ew dil
bahweriya wan qewîn e
        di her gotin
û çiriskên çavên wan de
rohniya azadiyê, xuya ye

Ji destpêkê ta dawî
dîtin tar û mar e, dîroka tarî
hatin zelal bikin,
zelal bikin jînê
                bi mêranî

can bi can
hilgirtin doza xwe
ku bînin cih, daxwaziyê
di riya pêşiyan de
rakin meydanê, mêrxasiya **Yezdan Şêr**
bahweriya **Seyid Riza**, a qewîn



Ewan wek Keliha Diyarbekrê
hember dijmin rawesta ne
bi dilekî şad
        wek Birca Belek
Kurdistan dineqişînin
bi rengekî zêrîn

Ji bo A.C.

## Bêrîvan

Rojbaş xoşewîst
dilocan
          rojbaş
cegera min
          silav

Xeyal rohnî dibin,
di vê jîna bi birîn de
çav brûsk
ku xewn weha xweş
roja min bê hewar
          bê tirs

Rojbaş dilê şêrîn
          rojbaş

T Ê D A Y Î

Pêşgotin .......................... 4
Axa me .......................... 5
Ewrên reş .......................... 6
Azad dibin .......................... 7
Birînên xwe dihîvêzim ............ 8
Çi dixwazim ? .................... 9
Birakî min hebû .................. 10
Dayika niştîman .................. 11
Birîndar im ...................... 16
Kurd in em ....................... 17
Ji bo azadî ...................... 19
Name (I) ......................... 20
Name (II) ........................ 24
Çanda mêtingehkaran .............. 28
Jinên me ......................... 30
Keça Kurd deng bide .............. 31
Bo dîlberê ....................... 32
Ji xortan re ..................... 34
Ez xwedî birînek reş im .......... 35
Dûr im ez ........................ 36
Xoşewîsta min welatê dîlan ....... 37
Megrî ............................ 38
Gula min ......................... 40
Ew ne mirin e na mirin............ 42
Azadî dixwazin ................... 44
Kîn .............................. 45
Ew bûn li şerr ................... 46
Pêşmerge (I) ..................... 48
Pêşmerge (II) .................... 49
Pêşmerge (III) ................... 50
Dîlan ............................ 52
Stirana dilê min ................. 54
Bêjin bes e koletî ............... 56
Ji dotmamê re .................... 57
Têkoşer in em .................... 59
Nizanim jînê avakim .............. 61
Evîndarê welêt ................... 63
Lawê kuştî ....................... 65
Hêvî ............................. 67
Dîroka tarî rohn dikin ........... 68
Bêrîvan .......................... 71

# *Lied Der Aarde*




# Medeni Ferho

Helbestên Holandî

130,- FrB.





(......)
mendalên sêwî
li ser sîngên dayikan
şîr ji devên nazik diherike
hê di destpêka jînê de, dîl
(.........)

TIGRIS - Rijke Klarenstraat, 45 - 1000 Brussel